[ all together
hep beraber •
alle zusammen

**Rêbernameya MAXI Lîstikê**

# NAVEROK


- Derheqê Projeyê da | 5
- Derheqê Maxi Lîstikê da| 5
    - Çawa Dihê Lîstin? | 5
- Qertên Lîstikê û Kategorî | 5
- Pêşnîyazên Giştî ji bo Perwerdekaran | 5
- Berdewamîya Lîstikê | 5
- Pirsgirêkên Mihtemel û Pêşnîyazên Çareserkirinê | 5
- Mînakên ji bo Lîstikên Lêgermbûnê | 5
- Pêşnîyazên Alternatîf bo Tetbîqkirinê | 5
- Kunye| 5

**Piştgir û Birêvebirên Projeyê**

Projeya HEP BERABERê (HEMÛ BI HEV RA), bi hevkarîya Anadolu Kültür û Landesweiten Koordinierungsstelle Kommunale Integrationszentrenê (LaKI) û piştgirîya Stiftung Mercatorê, di navbera salên 2017-2019an da pêk hatîye.

## DERHEQÊ PROJEYÊ DA

ÎNÎSÎYATÎFA HEVKARÎYA ELMANYA-TIRKÎYEYÊ DI WARÊ PIŞTGIRÎYA PENABERAN DA
ALL TOGETHER / HEP BERABER / ALLE ZUSAMMEN / HEMÛ BI HEV RA

Înîsîyatîfa me li Tirkîye û Elmanyayê bi wê armancê derketîye holê ku bikare pêk ve bifikire li ser rêbazên qertêker yên avakirina civakîbûneka giştgir û wasiteyên pratîk yên alternatîf yên bi lihevkirina civakî ra guncandî dabîn bike li hemû warên ku zarok û ciwanên penaber û ne-penaber, yên xwedî rabihurîyên cuda yên sosyo-kultûrî, -bi taybetî li dibistanan- pêkve lê dijîn.

Bi hêza ku me ji hevkarîya nêzîk ya Tirkîye û Elmanyayê ya xwedî rabihurîyeka kevin di vê mijarê da û ji fehma wan ya ji-hev-fêrbûnê wergirtîye, me bi du pirsên hevpar yên serekî da rêyê:

1. Ji bo em zarokên xwedî rabihurîyeka penaberî bi lez tev li jîyana civakî û perwerdeyî bikin û wan teşwîq bikin ku bibin beşdarên aktîftir, em dikarin çi cure materyalên fêrbûnê yên giştgir yên li gor pêdivîyên berbiçav yên meydanê bi pêş ve bixin?
2. Ji bo ku lihevkirina civakî wek qonaxeka dualî saz bibe û tevkarî lê bihê kirin, em çawa dikarin pêkve naverokên xwedî navendeka kultûrî û hûnerî çêbikin ku armanca wan bikaranîna hevbeş ya hemû zarok û ciwanan be.

Di nav qonaxa du salan da, me zêdetirî 40 pisporan ji du welatan anîn cem hev û li ser van pirsiyaran em HEMÛ PÊK VE (HEMÛ BI HEV RE) fikirîn.

**Beşdarên Me yên Projeyê**
Projeyê, komeka esasî ya xwedî gelek perwerdekar û aktorên civaka sîvîl çêkir û li derdora vê peywendîyeka xurt û berfireh danî. Perwerdeker, pisporên xizmeta civakî, dersdar, akademîsyen, pisporên perwerdeya ne-formel, psîkolog, perwerdekarên dramaya afirîner, pedagogên muzeyê, terapîstên hûnerê, muzîsyen û lêkoler yên ji Tirkîye û Elmanyayê hatin cem hev.

**Komên Me yên Xebatê**
Bi wesîleya civanên me yên di çarçoveya projeyê da, beşdarên me derfet peyda kirin ku mînakên baş yên di warê xwe da nîşanî hev bidin, pêk ve çavderîyê bikin li ziyaretên meydanî yên cuda û ji hevûdin fêr bibin. Li gor warên pisporî û eleqeyê, 6 komên xebatê yên tematîk peyda bûn. Van komên xebatê fikirên xwedî navendeka perwerdeya kultûrî û pêşnîyazên çareserîya hevpar bi pêş da birin ku piştgirîya “pêkvejîyan”ê xala serekî bû. Wan ev fikirên hevpar yên bikaranîna aktîf ya îfadeya hûnerî wekî muzîk, hûnerên performansê, resim, peyker, lîstik, dramaya afirîner, edebîyat, dansê, tevî miqatebûna li pêdivîyên babetên cuda, veguherandin berhemên şênber, amûrên perwerdeya alternatîf.

**Berhemên Projeya Me**
Berhemên ku piştî projeya HEMÛ PÊK VEyê derketine holê,

- nêzîktêdaneka rêxweşker bo fêrbûna giştgir qebûl dike û armanca wê tevlêkirina hemû zarokên penaber û ne-penaber e.
- alîkarî dike ku pirzimanî û cihêrengîya kultûrî wekî nirx û zengînîyekê bihê qebûlkirin û balê dikêşe ser hêza “perwerdeya ne-formel” ya di vî warî da.
- wasiteyên fêrbûna bi lîstikan destekkirî, yên afirînerîyê, yên bihêzkirina qabîlîyetên îfadeya şexsî û kolektîf û yên fêrbûna bi hemsalan destekkirî pêşkêş dike, bi vê wesîleyê kultûra pêkvejîyanê di nav zarok û ciwanan da xurt dike.

- bixwebawerîya zarokên xwedî jîyaneka penaberî û koçberî xurt dike, nahêle ku di pêvajoya hînbûna derdora nû ya jîyanê ra ji mîrateyên xwe yên kultûrî biqetin, û tevî parastina peywendîyên bi mîrateyê ra, qadên nû vedike ji bo sazkirina peywendîyên nû.
- piştgirî dike ku zarok hem zimanên xwe yên malbatê hem jî zimanê civaka têda fêr bibin; gava ku vê dike, nêzîktêdanên nûxwaz yên perwerdeyê bi kar diîne bi rêya kultûr, hûner û lîstikê.

Her komeka xebatê berhemeka hazir bo pratîka li meydanê pêk anî ku dibin mînak ji van prensîban ra. Berhemek jî ev kitêboka **MAXI Lîstikê** ye ku niha di destê we da ye.

Hûn dikarin di ser navnîşana www.hep-beraber.orgê ra bigihîjin hemû berhemên projeyê.

## DERHEQÊ MAXI LÎSTIKÊ DA

**Armanca Lîstikê:** Tevkarîya li kultûra pêkvejîyanê û lihevkirina civakî, kêmkirina cihêkarî û pêşdarazîyên di nav zarok û ciwanan da û hêsankarîya ji bo keşifkirina tiştên hevpar. MAXI Lîstik bi wê armancê hatîye sêwirandin ku bikare zarokên xwedî rabihurîyên cuda bi rêya lîstikê biîne cem hevûdin.

**Hejmara Lîstikvanan:** Lîstik bi 2 komên herî kêm 2 kesî û herî zêde 4 kesî dihê lîstin.

**Rêjeya Temenî:** Koma temenî ya ji bo lîstikvanan dihê pêşnîyazkirin, 8-12 (+/-1) e.

**Mekan:** Hema li her mekanekî hundirî yan jî derveyî yê misaid ji bo cîbicîbûna zemîna lîstikê ya 12 metrekareyî çêdibe ku bihê lîstin.

**Mawe:** Her tûreka lîstikê teqrîben 45 deqîqe didome.

### Di tûrikê MAXI Lîstikê da çi û çi hene?

**Zemîna Lîstikê:** Parkûreka lîstikê ya 12 metrekareyî

**Qertên Lîstikê:** 85 heb qertên kategorîyê û 6 heb qertên "gavekê bi paş da biçe", bi giştî 91 heb qertên lîstikê

**Çerx:** Çerxeka bi rehenda 40x40cm û hejmarên 0, 1, 2, 3, 4 li ser heyî

**NÎŞE:** Heger daxwaz hebe, lîstik çêdibe ku ji dêleva çerxê bi zareka qerton ya pir mezin -ku bi bikaranîna modela di beşa Pêvekan da dikare bihê amadekirin- bihê lîstin.

### MAXI Lîstik Çawa Dihê Lîstin?

*Berî destpêkirina lîstikê girîng e her perwerdekar bi înîsîyatîfa xwe ya dahêner dîyar bike ku armanca serekî ya vê lîstikê ne biserketin e lê naskirina hevûdin û kêf û şahîya pêkve ye.*

- Zemîna lîstikê li qadeka vala dihê raxistin.
- Qert baş dihên lihevxistin û li beşa "Qert"an ya li ser zemînê, û Çerx jî li beşa "Çerx"ê dihên cîbicîkirin.
- Zarok dabeşî 2 komên bi navê Koma Şîn û Koma Binefşî dibin.

*Di dîyarkirina koman da, pûte bi belavîya cihêrengîya kultûrî di nav koman da û belavîya zayendî dihê dayîn.*

- • Kom, di xalên destpêkirinê yên aîdî rengekomên xwe da li kêlekên beramber yên zemîna lîstikê, dikevin şûna xwe (Koma Şîn di xala destpêkirinê ya rengşîn da, Koma Binefşî di xala destpêkirinê ya rengbinefşî da).

*Xala destpêkirinê, pêşîya malika ewil ya parkûrê ye. Zarok, bi destpêkirina lîstikê ra, divê li derveyê parkûrê bisekinin.*

- Endamek ji her komê, çerxê dizivirîne û koma ku reqema herî bilind bidestxistî dest bi lîstikê dike.

*Di dîyarkirina destpêkerê lîstikê da, gava çerxa zivirandî li ser sifirê (0) bisekine, ew kom xwedî wî heqî ye ku çerxê cardin bizivirîne. (Ev qayîde tenê ji bo merhaleya destpêkê meqbûl e.)*

- ÇERX: Endamekî koma ku heqê destpêkirina lîstikê bidestxistî çerxê dizivirîne, endamên komê bi qasî reqema di çerxê da bi pêş da diçin.
- QERT KIŞANDIN: Endamê ku çerxê dizivirîne, qerta herî jor ya beşa “Qert”an dikişîne û vedigere cem koma xwe. Endamên komê pêk ve bi dengekî bilind talîmata di qertê da dixwînin û tetbîq dikin. Sembola heye li ser qertên ku divên bi dengekî bilind bihên xwendin. Tenê qertên hestanîyên xwedî sembola çênabe ku bi dengekî bilind bihên xwendin.
- Dîsa heman endam, qerta hatî kişandin û talîmata wê pêk hatî cardin dixe herî jêra desteya qertan.

*Dihê dîqetkirin ku di her tûrê da endamekî cudatir çerxê bizivirîne û kesê çerx zivirandî di wê tûrê da qertê jî bikişîne.*


- Dor dihê ser koma din. Endamekî komê çerxê dizivirîne, endamên komê bi qasî reqema di çerxê da bi dest hatî bi pêş da diçin. Endamê ku çerxê dizivirîne, qerta herî jor ya beşa “Qert”an dikişîne û vedigere cem koma xwe. Endamên komê pêk ve bi dengekî bilind talîmata di qertê da dixwînin û tetbîq dikin. Lîstik bi vî awayî didome.
- Komek heger di dema lîstikê da were ser malika ‘cih biguhere’, 2 kom cih pev diguherin û derbasî malikên hevûdin dibin, lêbelê alîyê wan yê bipêşdaçûnê naguhere.

*Piştî cihguherandinê qerta nû nahê kişandin, lîstik bi çerxzivirandina koma din didome.*

- Komek heger di dema lîstikê da were ser malika ‘vegere serî’ ya aîdî rengê xwe, dê vegere xala destpêkirinê ya aîdî rengê xwe. Qerta nû nakişîne, dor dihê ser koma din.
- Komek heger were ser malika “vegere serî” ya aîdî rengê koma din, (ev ferman ji ber ku ne ji bo wê komê ye) qerta nû dikişîne û bi lîstikê berdewam dike.
- Koma parkûra lîstikê temam kirî û herî pêşî gihiştî xala destpêkirinê ya koma din, di lîstikê da bi ser dikeve.

*Ji bo temamkirina parkûrê tenê ne bes e ku mirov bihê ser malika dawî ya parkûra lîstikê, her weha lazim e ku ew malik jî bihê derbaskirin û mirov ji parkûrê derkeve.*

*Di dawîya lîstikê da, prensîba herî pêşî hatî gotin dihê tekrarkirin: Armanc ne biserketin e, dembihurandineka xweş ya pêkve, naskirina hevûdin û kêf û şahî ye.*


DESTPÊK
VEGERE SERÎ
CIH BIGUHERE
CIH BIGUHERE
Maxi Lîstik
1
0
3
1
2
4
VEGERE SERÎ
DESTPÊK

## QERTÊN LÎSTIKÊ Û KATEGORÎ

Di MAXI Lîstikê da 85 qertên kategorîyê û 6 qertên ‘gavekê bi paş da biçe’, bi giştî 91 qert hene. 30 qert di kategorîya Hevparîyan da, 37 qert di kategorîya Hereketan da, 6 qert di kategorîya Hestan da û 12 qert jî di kategorîya Zimanan da hene. Her kategorîyek li ser qertan bi rengekî cudatir dihê nîşandan.

- Hevparî: Şîn
- Hereket: Kesk
- Ziman: Narincî
- Hest: Sor

### KATEGORÎYA HEVPARÎYAN


Armanca vê kategorîyê ew e ku zarok bi hevalên koma xwe ra hevparîyên navbera xwe bibînin û haydarîyên wan yên derheqê van hevparîyan da zêdetir bibin. Her weha piştgirîya meharetên wekî dîyalogê, bihîstina nêrînên cihêreng û peydakirina biryarên hevpar yên ji vir dike.

Di nîveka her qertê da talîmatek heye. Wezîfeya komê ew e ku bersiveka hevpar û hevfikir ji bo hemû endamên komê peyda bike. Ji ber vê, endam bi hev ra diaxivin û biryareka hevpar digirin û wê bersivê bi dengekî bilind dibêjin.

**Talîmatên Kategorîya Hevparîyan:**

- Straneka ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Lîstikeka ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Xwarineka ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Rengekî ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Heywanekî ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Xêzefîlmekî ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Kitêbeka ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Demsaleka ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Cismekî asmanî yê ku hûn hemû dixwazin bibînin peyda bikin.
- Stranbêjekî ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Lîstikvanekî sînemayê yê ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Fîlmekî ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Derseka ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Lîstikeka bi topê dihê lîstin ya ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Çîrvanokeka ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Sporeka ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Bajarekî ku we hemû berê dîtîye peyda bikin.
- Bajarekî ku hûn hemû dixwazin biçinê peyda bikin.
- Sebzeyeka ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Zimanekî ku hûn hemû dixwazin fêr bibin peyda bikin.
- Pîşeyekî ku ji bo we hemûyan balkêş e peyda bikin.
- Cureyekî pasteyê yê ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Tiştekî ku hûn hemû ji xêzkirina wê hez dikin peyda bikin.
- Welatekî ku hûn hemû dixwazin bibînin peyda bikin.
- Cureyekî dondirmeyê yê ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Kulîlkeka ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Cilûbergekî ku hûn hemû ji lixwekirina wê hez dikin peyda bikin.
- Bêhneka ku hûn hemû jê hez dikin peyda bikin.
- Amûreka muzîkê ya ku hûn hemû ji guhdarkirina wê hez dikin peyda bikin.

**Nîşeyek bo Perwerdekaran:** Pê ewle bin ku talîmata li ser qertê bi dengekî bilind hatîye xwendin û hatîye famkirin, û hemû endamên komê tev li gengeşeyê bûne û biryara paşîn pêkve hatîye girtin.



## KATEGORÎYA HESTAN

Armanca vê kategorîyê ew e ku zarok hay ji hestên serekî yên cuda û rewşên eleqedarî wan hebin û meyildarî axaftina derheqê hestan da bin. Rola perwerdekaran ya di vê kategorîyê da gelekî girîng e; di her merhaleyê da li nik wan e û di cihên hewce da rave dike.

Li ser her qerteka hestan, hesteka bi zimanekî cudatir hatîye nivîsandin.

*Baldarî! Qertên hestan bi dengê bilind nahên xwendin.*

Endamên komê, hesta li ser qertê nivîsandî di dilê xwe da dixwînin, bêyî ku koma din bibihîze. Piştra hestê bi hereketên rûyî û laşî pêkve nîşanî koma din didin (wekî “sînemaya bêdeng).

Koma din hewil dide hestê texmîn bike. Kom gava bersiva rast dide, jê ra li çepikan dixin.

Piştra perwerdekar pirsa (li jêrê) aîdî wê hestê bi dengekî bilind ji hemû lîstikvanan dipirse. Mînak, heger hesta li ser qertê “tirs” be; hesta tirsê piştî ku bi awayê sînemaya bêdeng ji koma hember ra dihê qalkirin û koma hember jî pê derdixe, perwerdekar ji her kesî dipirse ku “Hûn çawa alîkarîya hevalekî xwe yê tirsîyayî dikin?” Bersivên zarokên dilxwaz dihên guhdarkirin. Herî dawî, heger perwerdekar hewcehî pê bibîne, dikare ji agahîyên beşa Agahîyên Giştî yên rûpela piştî wê îstîfade bike û raveyên zêdetir bike.

**Talîmatên Kategorîya Hestan û Pirsên Perwerdekaran:**

**TIRS:** Hesta tirsê bi hereketên rûyî û laşî nîşanî koma din bidin.
Pirsa perwerdekarî ya bo hemû endaman:
“Hûn çawa alîkarîya hevalekî xwe yê tirsîyayî dikin?”

**HÊRS:** Hesta hêrsê bi hereketên rûyî û laşî nîşanî koma din bidin.
Pirsa perwerdekarî ya bo hemû endaman:
“Dema hûn hêrs dibin, hûn çi dikin ji bo ku aşt bibin?”


**XEMGÎNÎ:** Hesta xemgînîyê bi hereketên rûyî û laşî nîşanî koma din bidin.
Pirsa perwerdekarî ya bo hemû endaman:
“Hûn kîjan kesî yan jî kesan dikin hempişkê xemgînîya xwe?”

**ŞADÎ:** Hesta şadîyê bi hereketên rûyî û laşî nîşanî koma din bidin.
Pirsa perwerdekarî ya bo hemû endaman:
“Çi we şad dike yan jî şad dikin?”

**HEYECAN:** Hesta heycanê bi hereketên rûyî û laşî nîşanî koma din bidin.
Pirsa perwerdekarî ya bo hemû endaman:
“Gava hûn heyecanî dibin, hûn vê di kû dera laşê xwe da hîs dikin?”

**ARAMÎ:** Hesta aramîyê bi hereketên rûyî û laşî nîşanî koma din bidin.
Pirsa perwerdekarî ya bo hemû endaman:
“Di kîjan rewşan/deman da hûn xwe aram hîs dikin?”

**Nîşeyek bo Perwerdekaran:** Hin zarok dibe ku nexwazin bersiva pirsên derheqê hestan da bidin yan jî xwe ji bersivdayînê dûr bixin. Vê bi awayekî normal qebûl bikin. Pêşekîya ewil ne israrkirin yan jî zorlêkirin e lêbelê avakirina qadeka ewle ye ku zarok bikare lê bersiv bide. Armanca me ya bi qertên hestan, pêhisandina zarokî bi wê derdorê ye ku kengê bixwaze dikare behsa hestên xwe bike. Li hemberî bersivên cuda yên zarokan hûn dikarin îfadeyên pesendker yên wekî “nexwe bertek yan jî helwêsta her kesî ya di van rewşan da dikare biguhere” bi lêv bikin. Her weha, bi berçavkirina taybetîyên zarokên koma xwe ra hûn dikarin pirsên derheqê hestan da nepirsin û tenê bihêlin ku niwandin bihên kirin.



Agahîyên Giştî derheqê Hestên Xerab da:

Tiştên ku hûn dikarin piştî wergirtina bersivên pirsa derheqê tirsê da lê zêde bikin:

- Gava ku mirov ditirse, çêtir e ku mirov ji mirovên derdora xwe alîkarîyê bixwaze. Em jî dikarin alîkarîyeka weha bidin hevalên xwe yên tirsîyayî. Mirov tenê li nik wan be jî, ev dê bibe alîkarîyeka mezin ji bo hevalên me yên tirsîyayî. Di rewşeka weha da, hûn dikarin li nik wan bin û heger bixwazin biaxivin, hûn dikarin bibêjin ku ez li vir im. Tevî ku tirsîyane jî, tiştekî xweş e ku bikarin behsa hestên xwe bikin. Ji alîyekî din ve jî, ji dêleva ku hûn ji bo mirovekî tirsîyayî bibêjin 'netirse', bi wan bidin hîskirin ku ew ne bi tenê ne û di ewlehîyê da ne.

Tiştên ku hûn dikarin piştî wergirtina bersivên pirsa derheqê hêrsê da lê zêde bikin:

- Pêşî divê mirov hay jê hebe hêrsoyî ye ji bo ku bikare aşt bibe. Girîng e ku mirov sedema hêrsa xwe dîyar bike. Hûn dikarin hewil bidin wê sedemê peyda bikin û li ser vê bifikirin. Dema hîskirina hesta hêrsê, stendina nefesên kûr û hêdî dê bibe alîkar. Em dikarin vêya ha ji bo demekê bikin, piştra xeyal bikin ku hêrsa me jî bi nefesa me ra dûr dikeve, ev yek hesta me ya hêrsê kêm dike. Her weha birêveçûn, mijûlbûna bi tiştekî din ra, xwendina kitêban, nivîsandina hestan yan jî pêkanîna hin tiştên bo we kêfxweşker jî bikêrhatî ye.

Tiştên ku hûn dikarin piştî wergirtina bersivên pirsa derheqê xemgînîyê da lê zêde bikin:

- Herî pêşî hûn dikarin hewil bidin fam bikin ka çi we xemgîn dike. Hewil bidin ku wî tiştî bikin heger tiştek hebe hûn bikarin derheqê sedema xemgînîya xwe da bikin. Ji alîyê din ve, zorê li xwe nekin ji bo ku hûn nebin xemgîn. Carinan xemgînbûn ne pirsgirêkek e. Girîn ne pirsgirêkek e. Em her tim nikarin bextewer bibin û ne mecbûr in bibin. Dema xemgînîyê çêtir e ku hûn maweyeka dirêj tenê nemînin. Bi hevalên xwe ra û bi malbata xwe ra bin û hestên xwe ji wan ra bibêjin û hewila axaftinê bidin. Her tim destekeka pir girîng e hebûna hin kesên li derdora we ku hûn bikarin hestên xwe ji wan ra bibêjin.

## KATEGORÎYA HEREKETAN:


Armanca vê kategorîyê ew e ku zarok hiş û laşê xwe bi hev ra bixin hereketê û pêkve dest bi çalakîyê bikin. Cihgirtina di lîstikên bi hereket û şahînet da û tehmstendina ji vê pêkvebûnê, roleka jîyanî digêre di peywendîdanîna zarok û ciwanan da û piştgirîya kultûra "pêkvejîyan"ê dike.

Li ser qertê talîmatek peyda dibe. Endamên komê çalakîya di talîmatê da pêkve pêk diînin. Mînak, heger li ser qertê "Teqlîda Mirîşkê bikin" nivîsandî be, endamên komê pêkve teqlîda mirîşkê dikin. Mînak, heger li ser qertê "Bibin Gêzîya Ceryanê" nivîsandî be, lîstikvan her wekî ku cihê cihê dikarin wekî gêzîya ceryanê hereket bikin, her weha her lîstikvanek dikare parçeyekî cuda nimayîş bike û hemû pêkve gêzîyeka ceryanê tenê pêk biînin. Ev, maye li ser afirînerîya lîstikvanan.

**Talîmatên di kategorîya hereketan da ev in:**

- Teqlîda mirîşkê bikin.
- Wekî çivîkan biwîtin.
- Pêkve dans bikin.
- Pêkve stranekê bibêjin.

- Di cihê xwe da bazdin.
- Pênc caran çok vedin û rabin.
- Pêkve awayekî nû yê silavlihevkirinê peyda bikin.
- Ji hemû hevalên koma xwe ra bibêjin “lêde” (çak).
- Bibin meqarneya dirêj ya pijîyayî. Bibin meqarneya dirêj ya nepijîyayî.
- Wekî gogê xwe hilpekînin.
- Bibin ba.
- Bi dengekî bilind bikin tîqetîq.
- Wekî pinpinîkê hereket bikin.
- Wekî şeytanokan hereket bikin.
- Teqlîda şêrê tirsîyayî bikin.
- Teqlîda hespekî avî yê bextewer bikin.
- Bibin gêzîya ceryanê.
- Di konsereka pîyanoyê da wekî pîyanîst û temaşekaran hereket bikin.
- Wekî muzîsyenên li kolanan konser dayî hereket bikin.
- Wekî lîstikvanên basketbolê yên di maçê da hereket bikin.
- Wekî peykerên li muzexaneyê bisekinin.
- Wekî spîkerê futbolê yê maç pêşkêş kirî biaxivin.
- Wekî pîlotê balafirê anons bikin.
- Teqlîda flamîngoyan bikin.
- Wekî nehengan deng bikin.
- Pêkve wekî trênê bimeşin.
- Wekî maran hereket bikin.
- Bibin darên li daristanê.
- Bibin masîyên li okyanûsê.
- 10 sanîyeyan di cihê xwe da bizivirin.
- Bi koma din ra hereketeka nû ya silavlihevkirinê peyda bikin.
- Wekî pitikan bi çarlepkan biçin.
- Sê tûran li dor koma din bazdin.
- Bi her kesê koma din ra ji jêr û jor ve bibêjin “lêde”.
- Hewil bidin kesekî koma din bidin kenandin.
- Hewil bidin kesekî koma xwe bidin kenandin.
- Wekî beqan xwe çeng bikin.




**Nîşeyek bo Perwerdekaran:** Di talîmatên teqlîdê yên vê kategorîyê da, endamên koma din bi refleksekа ji ber qertên hestan dikarin hewil bidin ku bersivê texmîn bikin. Hewce nake ku hûn vê asteng bikin yan jî bisekinînin.

## KATEGORÎYA ZIMANAN

Armanca vê kategorîyê ew e ku zarokan bi awayê pirzimanî yê derdora têdayî hevnas bike û rê li ber veke ku bi wesiteya lîstikê serwextî zimanên cuda bibin. Xwedî girîngîyeka mezin e di avakirina civakên giştgir da heger zarok û ciwan bizanin ku mirov bi zimanên cuda dizanin û diaxivin, û hîs bikin ku her zimanek xwedî heman nirx û girîngîyê ye. Ji ber vê yekê, armanca serekî ya kategorîya zimanan ew e ku pirzimanîyê berbiçav bike. Her weha ev qert dibin alîkar ku zarok hin peyvên hêsan, bi zimanên cuda bibihîzin û fêr bibin.

Li ser her qertê talîmatek heye. Mînak, “Bi zimanên cuda bibêjin ‘merheba’.”

Zarokên komê, wê peyvê yan jî hevokê bi zimanên dizanin dibêjin. Zarokek gava berginda wê peyvê ya bi zimanekî cudatir dibêje, hevalên komê wê peyvê bi dengekî bilind tekrar dikin. Mînak, heger li ser qertê ‘Bi zimanên cuda bibêjin merheba’ nivîsandî be, zarokek ji komê gava bibêje ‘hola’ (spanyolîya wê), kom pêkve ‘hola’yê tekrar dikin. Zarokek din ji komê gava bibêje ‘ciao’ (îtalîya wê), pêkve ‘ciao’yê tekrar dikin.

Heger hewcehî pê bibîne, perwerdekar ji zarok/komê dipirse ka ew peyva bilêvbûyî bi kîjan zimanî ye.

Herî dawî, endamên komê piştî ku bilêvkirina peyvê ya bi zimanên dizanin diqedînin, firsendê didin koma din ji bo ku bergindên peyvê yên bi zimanên cuda lê zêde bikin.

**Talîmatên Kategorîya Zimanan:**

- Bi zimanên cuda bibêjin “merheba”.
- Bi zimanên cuda bibêjin “spas”.
- Bi zimanên cuda bibêjin “sibeha te bi xêr”.
- Bi zimanên cuda bibêjin “bi xatirê te”.
- Bi zimanên cuda bibêjin “hevalê min / hevala min”.
- Bi zimanên cuda bibêjin “ez ji te hez dikim”.
- Bi zimanên cuda bibêjin “dilşad im”.
- Bi zimanên cuda bibêjin “bibore”.
- Bi zimanên cuda bibêjin “noşî can be”.
- Bi zimanên cuda heta 3yan bijimêrin.
- Ji kesekî koma din ra bi zimanekî cuda bipirsin “Çawa yî?”.
- Ji kesekî koma din ra bi zimanekî cuda bipirsin “Navê te bi xêr?”
- Diğer gruptan birine farklı bir dilde “Adın ne?” diye sorun.



## PÊŞNÎYAZÊN GIŞTÎ BO PERWERDEKARAN

Perwerdekarên me yên hêja,

Em pê bawer in ku hûn dê MAXI Lîstikê bi zanîn û agahdarîya xwe bi awayê herî qertêker û keyfbexş bi rê ve bibin. Pêşnîyazên li jêrê bi wê armancê hatine amadekirin ku dema pêdivîyê hûn bikarin ji wan îstifade bikin.

- Berî tetbîqkirina bi zarokan ra, pê amin bin ku we kitêbok bi hûrgilî xwendîye û lîstikê baş fam kirîye. Heger hûn bixwazin, berî lîstandina lîstikê ya bi zarokan, bi hevalên xwe ra biceribînin. Ev yek, dê hîsa rehetîyeka zêdetir bide we dema birêvebirina lîstikê bi zarokan ra.
- Qadeka ewle ya lîstikê bo zarokan dabîn bikin. Qadeka bêyî endîşeya ewlehîyê ji bo tetbîqkirina lîstikê hilbijêrin.
- Dema lîstikê bila bala we li peywendîyê be. Tim û dayîm bi zarokan ra bikevin nav temasa çavan.
- Dema birêvebirina lîstikê bi piranî lê miqate bin ku hûn li derveyê zemîna lîstikê sekinîne, da ku hemû zarok we ji heman mesafeyê bibînin û konsantrasyona wan ji dest neçe. Tenê dema hewce kir bikevin nav zemîna lîstikê, mînak dema ji bo nêrîna li talîmata di qertê da û alîkarîkirinê.
- Pê amin bin ku hemû zarok pirs û bersivên koma din bihîstine û guhdar kirine. Dibe ku rêbazeka baş be ku mirov bikare pirsê bi zarokan bide tekrarkirin. Ji zarokan bixwazin ku pirsan bi dengekî bilind bixwînin û bersivan bi dengekî bilind bidin ji bo ku koma din jî bibihîze. (Tenê lazim e talîmatên li ser qertên hestan bi dengekî bilind nexwînin ji bo ku koma din nebihîze.)
- Hin zarok dikarin hewesdartir tevbigerin û her tim bixwazin bersiv bidin, hin zarok jî dikarin tercîh bikin ku bêdengtir bimînin. Bêyî ku israr bikin, pê amin bin ku her kes beşdarî lîstikê dibe. Heger endamek ji komê bixwaze dest bi axaftinê bike, bêyî zorlêkirinê hewil bidin ku alîkarîya wî bikin.
- Çavdêrîya peywendîya navbera zarokan bikin. Çêdibe ku hin zarok dema lîstikê bi awayekî bêdîqet û agresîf bi hevalên xwe ra tevbigerin. Bi zimanekî baş û minasib rê li ber tevgerên xerab bigirin. Tevgerên baş teqdîr bikin û teşwîq bikin.
- Gelekî girîng e ku zarok dema lîstikê xwe bi awayekî baş hîs bikin û jê keyfxweş bibin. Ji bo vê yekê, bo mînak hûn dikarin bixwazin ku kom bila piştî her bersivê ji hev ra li çepikan bixin. Her weha, hûn dikarin peyvên teqdîrkirinê yên wekî 'pir baş e', 'çi straneka xweş e', 'bijî', 'niwaze' bibêjin.
- Girîng e ku hûn di dema bersivdayînên bo motîvasyonê da bi awayekî adil tevbigerin. Divê tu zarokek nefikire ku perwerdekar bêhtir piştgirîya komekê yan jî endamekî dîyarkirî dike yan jî bi wî ra bêhtir eleqedar dibe. Jê amin bin ku hûn bi heman awayî bi her zarok û komê ra eleqedar dibin.
- Mimkin e ku tenê perwerdekarek lîstikê bi rê ve bibe. Lêbelê dema hewcehî pê çêbû, du perwerdekar jî dikarin tê da hebin. Tew dê pêvajoyê hêsantir bike heger perwerdekarê duyem zimanekî din yê zarokên komê bizane.
- Heger derfet hebin, her weha xebitîna bi piştgirîya wergêran dikare bibe alîkar bo piştgirîkirina pirzimanîyê. Digel vê yekê, perwerdekarê birêvebir yê lîstikê ne mecbûr e ku ji zimanekî zêdetir bizane. Armanc teşwîqkirina zarokan e ku hebûna pirzimanîyê ya di nav wê komê da bibînin. Perwerdekar dikare ji zarokên nav komê alîkarîya wergerê bixwaze. Bi vî awayî, lîstik dê wekî pêvajoyeka bi piştgirîya hemsalan bi rê ve biçe. Zarok dihên teşwîqkirin ku alîkarîya hevûdin bikin.
- Perwerdekar, bi berçavkirina taybetmendîyên zarokên koma xwe, heger hewcehî pê bibîne, dikare hin qertan di lîstikê da bi kar neîne. Van qertan ji pêşî ve dîyar dike û ji hev vediqetîne, di destpêka lîstikê da li malika qertan cîbicî nake.

## BERDEWAMÎYA LÎSTIKÊ

### 1. Berî Lîstikê (15 deqîqe)

a. Zemîna lîstikê li erdê raxin, qertan baş li nav hev bixin, qertan û çerxê li beşên eleqedar yên li ser zemînê cîbicî bikin. Di vê merhaleyê da zarok jî dikarin alîkarîya we bikin.

b. Navê zarokan bipirsin yan jî lîstikeka hevnasînê pêk biînin. Heger zarokan hev nas kiribe, 'lîstikeka lêgermbûnê' bilîzin.

c. Qayîdeyên Maxi Lîstikê yek bi yek bibêjin, berdewamîya lîstikê bi kurtî terîf bikin. Girîng e ku her zarok bizane ka dê di berdewamê da çi û çi bibin. Ji berê ve miheqeq dîyar bikin ku lîstik 45 deqîqe dewam dike.

d. Behsa qayîdeyên girîng yên lîstina lîstika komî bikin. Bi berpêkirina pirsa "Bila qayîdeyên me yên lîstikê çi bin?" bihêlin ku serê pêşîn lîstikvan van qayîdeyan dîyar bikin. Bi pirsên wekî 'Bi ya we dema lîstinê divê mirov di nav komê da çawa tevbigere?', 'Em çawa li hevûdin guhdar dikin?' piştgirîya vê pêvajoyê bikin. Birêvebirina we ya lîstikê dê hêsantir bike heger hûn ji berê ve li ser van qayîdeyan biaxivin û biryareka hevpar bigirin.

Bo mînak:

- Bi ya we dema dora koma din e, girîng e ku mirov li wan guhdar bike? Em pirsên wan jî meraq dikin, ne wisa? Em dixwazin bersivên wan jî bibihîzin.
- Dema axaftinê em hevûdin baş dibihîzin?
- Hem em gudarîya fikirên hevûdin bikin hem jî em fikirê xwe bibêjin. Em rêzê li fikirên cuda yên hevûdin bigirin.
- Dema em di lîstikê da li benda dora xwe ne, em cihên xwe neterikînin ji bo ku gava dora me hat, em bikarin bi rehetî cihê xwe peyda bikin.
- Em bi dengekî bilind bersiva pirsan bidin yan na kesên din nikarin me bibihîzin.
- Em bersiva pirsên koma din nedin, ev wezîfeya wan e. Lê piştî bersivdayîna wan, em dikarin biaxivin.
- Berî zivirandina çerxê, em li benda bersivdayîna koma din bin.

### 2. Lîstik (45 deqîqe)

Lîstik li gor wan talîmatan dihê lîstin ku di beşên berê yên vê rêbernameyê da hatine dîyarkirin. Heger demeka zêdetir hebe, çêdibe ku qewlê lîstikê bihê zêdekirin yan jî tûreka din jî bihê lîstin lêbelê gelekî girîng e ku ji destpêkê ve bo zarokan bihê gotin ku maweyeka dîyarkirî heye. Ev agahî dê di bidawîkirina lîstikê da bibe alîkar ku zarok vê qebûl bikin.

### 3. Piştî Lîstikê (15 deqîqe)

a. Piştî qedandina lîstikê, ji bo bidawîkirina xebatê, bi zarokan ra rûniştî yan jî li pêyan bibin çenber. Ji wan bipirsin ka lîstik ji bo wan çawa derbas bûye, çawa hîs dikin, dibe ku çi û çi ji lîstikê bi dest xistibin. Dikarin lê bifikirin û bibersivînin ka di lîstikê da herî pir ji çi hez kirine. Hewil bidin ku bersivan pêşî ji wan zarokên dilxwazê axaftinê wergirin.

b. Hewil bidin ku bila zarok spasîya hevûdin bikin, hevûdin pîroz bikin û xatir ji hevûdin bixwazin.

c. Lîstikê bi çepikan yan jî bi hilpekînê di cihê xwe da, bi awayekî keyfxweşî bi dawî bikin.

d. Ji zarokan alîkarî bixwazin ji bo berhevkirina hemû melzemeyên lîstikê. Heger zemîna lîstikê qirêjî bûbe, bi pûtepêdanî paqij bikin û rakin.

## PIRSGIRÊKÊN MIHTEMEL Û PÊŞNÎYAZÊN ÇARESERKIRINÊ

**Di serê lîstikê da gava komek çerxê bizivirîne û li sifirê bisekine dê çi bibe?**
Kom cardin çerxê dizivirîne. Ev qayîde tenê di destpêkirina lîstikê da qebûl dibe.

**Di dema lîstinê da gava komek çerxê bizivirîne û li sifirê bisekine dê çi bibe?**
Kom li malika xwe dimîne, qerteka nû nakişîne, dor dihê ser koma din.

**Komek heger li malikeka xwe ya berê bisekine dê çi bibe?**
Dê qerteka nû bikişîne û bi lîstika xwe berdewam bike.

**Du kom heger bihên ser heman malikê, zarok dê li kû bisekinin?**
Endamên komê yên ku wekî kesê duyem hatî nav malikê, dikarin li dor malikê bisekinin. Di nav demeka kin da koma din dê çerxê bizivirîne û ber bi malikeka din ve bidomîne.

**Komek heger qerta 'gavekê bi paş da biçe' bikişîne, piştî çûyîna bi paş da qerta nû dikişîne?**
Kom gava biçe malika xwe ya berê, qerta nû nakişîne, lîstik bi çerxzivirandina koma din berdewam dike.

**Lîstikvan heger li pey hev ji heman kategorîyê qert bikişînin dê çi bibe?**
Ev yek nabe pirsgirêk. Hejmara qertên aîdî kategorîyan di nav lîstikê da ne wekî hev in. Dînamîkên lîstikê hatine berçavkirin û ji kategorîyên dîyarkirî pirsên zêdetir hatine amadekirin. Ji ber vê yekê, îhtimala qertkişandina ji wan kategorîyan bilindtir e. Ji alîyê din ve, dîsa jî pêşnîyaz e ku qert baş bihên tevlihevkirin.

**Tu komek heger nikaribe berî 45 deqîqeyan parkûrê biqedîne dê çi bibe?**
Herî pêşî divê maweya demê berî lîstikê, di behskirina qayîdeyan da, bi awayekî girîng bihê gotin. Ya duyem, ber bi dawîya demê ve çêdibe ku agahdarîyên wekî "10 deqîqe maye ku em lîstikê biqedînin" yan jî '5 deqîqeya me ya dawî' bihên kirin. Divê hûn jê piştrast bin ka hemû zarok bihîstine. Di dawîya demê da careka din bi bîra zarokan dihê xistin ku armanca lîstikê ne biserketin lê kêf û şahînet e. Spasîya her du koman jî dihê kirin û hevpîrozkirina wan dihê pêkanîn. Derbasî çenbera bidawîkirinê dibin.

**Lîstik heger berî 45 deqîqeyan biqede dê çi bibe?**
Heger têra xwe wext hebe û dilê zarokan jî hebe, lîstik ji nû ve dihê destpêkirin. Di nav çenteyê lîstikê da bi qasî lîstina çend tûrên din jî qert peyda dibin.

**Koma nêzî dawîya parkûrê gava ji bo temamkirina lîstikê çerxê bizivirîne, reqema ku lê bisekine bi temamî bi qasî hejmara malikên mayî ye?**
Ji bo ku kom lîstikê bi dawî bike, heger reqema di çerxê da bihêle ku ji malika dawî bibihurin, bes e. Reqema di çerxê da, heger hejmara malikên mayî ji bo ku kom lîstikê bi dawî bike +1 yan jî zêdetir be, lîstik bi dawî dibe.

**Zarok divên di sazkirin û komûna lîstikê da beşdar bin yan na?**
Zarok divên bihên teşwîqkirin ku alîkarîya cîbicîkirin û komkirina melzemeyên lîstikê bikin. Girîngîya pêkvesazkirin û pêkvekomkirina lîstikê divê dîsa berî lîstikê bihê dîyarkirin; û divê bihê gotin ku piştî lîstikê dê her tiştî pêkve kom bikin.

**Heger zarokek beşdarî komê nebe divê çi bihê kirin?**
Dê ne rast be ku mirov wî zarokê berbehs mecbûrî vê bike. Lêbelê rasterast bi bilêvkirina navê wî yan jî bi pirskirina navê wî, dikare bihê teşwîqkirin ku beşdar bibe.

**Heger zarokek di lîstikê da ji ber sedemekê xeyalşikestî bûbe, dê di Çenbera Bidawîkirinê da destûr bihê dayîn ku ew vê yekê îfade bike?**
Zarok çêdibe ku di dema lîstikê da, ji ber dînamîkên komî, faktora şansî yan jî sedemên cuda xeyalşikestî bibin û encama xwestî bi dest nexin. Girîng e ku firsend bihê dayîn ji bo ku vê hestê îfade bikin. Divê bi sebirkarî bihê balkişandin ku dikarin gelek caran pêkve lîstikê bilîzin û her carê jî dê encam û pêvajoyeka cudatir derkeve.

## MÎNAKÊN JI BO LÎSTIKÊN LÊGERMBÛNÊ

Girîng e ku zarok berî destpêkirina lîstikê hevûdin nas bikin û di nav komê da xwe rehet hîs bikin. Xwehîskirina di rehetî û ewlehîyê da dibe alîkar ku ew bi awayekî çalak beşdarî lîstikê bibin û xwe bi rehetî îfade bikin. Lewma pêşnîyaz e ku berî destpêkirina MAXI Lîstikê, lîstikeka kin ya lêgermbûnê bihê lîstandin. Perwerdekar, dikare lîstikeka ji berê da dizane yan jî mînakeka li jêrê hilbijêre. Ya girîng, perwerdekar lîstikeka lêgermbûnê ya weha hilbijêre ku bikare bi ewlehî bi rê ve bibe.

**Lîstik 1: Kî Dimîne?**

Kom dibe çenber. Lîstik bi wî zarokê pêşîn dest pê dike ku dihê di nîveka çenberê da navê tiştekî bican û bêcan dibêje û xwe dike wekî wî tiştî. Zarok bi xwe biryar digire ka dê kîjan tişt be. Mînak dibêje ku ez dar im û wekî darê disekine. Piştra zarokên duyem û sêyem çi çax bixwazin tev li lîsttikê dibin, diçin nik zarokê di orteyê da û dibin parçeyên darê. Mesela, zarokê duyem gava dibêje 'ez gulîyekî darê me', zarokê sêyem dibêje 'ez rehên darê me' û her du jî bi awayê ku sekina zarokê pêşî temam bikin, formeka laşî werdigirin.

Pişt ra perwerdekar ji zarokê pêşîn dipirse ku "Bila kî bimîne?" Mînak, heger zarokê pêşîn bibêje ku bila reh bimîne, zarokê pêşîn û yê duyem di çenberê da vedigerin cihê xwe yê berê û zarokê sêyem cardin dibêje 'Ez rehek im' û bi tenê xwe dike wekî rehê. Piştra her du zarokên di dorê da wekî parçeyên rehê tev li lîstikê dibin. Mînak, zarokek dibêje "Ez kulîlkeka ji rehê derketî me" û xwe dike wekî kulîlka li rehê zêde bûyî. Zarokê sêyem dibêje "Ez moz im" û xwe dike wekî moza li wan zêde bûyî. Lîstik bi vî awayî, heta ku hemû zarok derkevin orteyê, didome.

**Lîstik 2: Tu Çi Dixwî?**


Kom dibe çenber. Dihê xwestin ku endamek wekî dilxwaz were orteyê. Yên din jê dipirsin ku "Tu çi dixwî?" û "Tu çi naxwî?" Dilxwazê li orteyê gava pirsa "Tu çi dixwî?" bibihîze, tiştên ku nehên xwarin dibêje û dibersivîne. Mînak, dibêje 'sendelî'. Ji bo pirsa 'Tu çi naxwî?' jî divê bi navên xwarinên ku dihên xwarin bersiv bide; mînak, şebeş.

Armanc tevlihevkirina hişî û şaşwazkirina dilxwazî ye. Pirs divên bi lezgînî bihên pirsîn da ku dilxwaz şaş bibe û lîstik rewşeka bi keyf û şahî wergire. Gava dilxwaz bersiveka xelet bibêje, zarokekî din derbasî orteyê dibe û lîstik bi vî awayî didome.


## PÊŞNÎYAZÊN ALTERNATÎF BO TETBÎQKIRINÊ

MAXI Lîstik, bi awayê parkûrekê hatîye sêwirandin li ser zemîn-lîstikeka qerase ya 12 metrekareyî û armanc ji vê yekê derfetdayîna bo zarokan e ji bo bikarin di qadeka fireh da hereket bikin û bi komî bilîzin. Ji alîyê din ve, dibe ku ne mimkin be mirov di şertên cuda da vê zemînê bi kar biîne. Hûn bi xwe jî dikarin zemîna lîstikê bi rêbazên cuda amade bikin bi armanca ku bi şertan ra li hev bike gava hewce kir yan jî hin guherîn bihên tevlêkirin heger lîstik bi heman komê ji nû ve bihê lîstin.

Hûn dikarin li jêrê mînakên afirîner bibînin ku perwerdekarên tetbîqkerên lîstika me ew bi pêş ve birine. Heger hûn jî lîstika me bi rêbazeka cudatir tetbîq bikin, ji kerema xwe bi me ra parve bikin. Ji bo vê, hûn dikarin ji malpera di kunyeyê da xwe bigihînin me.




Çêdibe ku hullahup yan jî çenberên mezin yên wekî wê li erdê bihên rêzkirin û parkûra lîstikê ji nû ve bihê sazkirin. Di lîstikê da divê hejmara malikên heyî bihê parastin. Çêdibe ku sembol û objeyek bihê bikaranîn ji bo diyarkirina malika CIH BIGUHERE û malika VEGERE SERÎ ya her komê. Kom dikarin di nav van çenberan (hullahup) da hilbihên, pêkve di nav van çenberan da, bi qasî hejmara di çerxê da bi pêş ve diçin. Di lîstikê da ÇERX û QERT bi heman awayî dihên bikaranîn.



Berî destpêkirina lîstikê çêdibe ku bi tebeşîrê çarçikgoşeyên mezin li erdê bihên xêzkirin û parkûreka nû bihê sazkirin. Di lîstikê da divê miheqeq hejmara malikên heyî, malikeka CIH BIGUHERE û malikeka VEGERE SERÎ jî bihê xêzkirin ji bo ku hevsengîya algorîtmîk xera nebe. Di lîstikê da ÇERX û QERT dîsa bi heman awayî dihên bikaranîn.

Ji bo alternatîfeka vebijarka ÇERXê ya di lîstikê da, modeleka ZARê hatîye pêşkêşkirin di malpera projeyê da. Bi mînakgirtina vê modela zarê, mimkin e ku mirov bi zarokan ra zarê ji melzemeyên qerton çêbike, rengîn bike û lîstikê bi vê zarê bilîze.



## KUNYE


**KOMA FÊRBÛNA PIRZIMANÎ - MAXI LÎSTIK**

**Fikir û Koma Tetbiqkirinê:**
Berfin Balık (IFAK e.V)
Hevidar Yıldırım (IFAK e.V)
Lia Gürün (ODGEDER)
Pınar Şimşek (Bir İZ Derneği)

**Koma Bipêşvebirinê:**
Berfin Balık
Betül Bozkurt
Dilara Köktürk Erden
Hevidar Yıldırım
İnanç Sümbüloğlu
Lia Gürün
Özlem Mumcuoğlu
Pınar Şimşek

**Şêwirmend:**
Betül Bozkurt

**Grafîk û Ilustrasyon:**
Björn Gooßes

**Dîzayn:**
Esra Göksu | www.esragoksu.com

**Koordînasyon û Tetbîqkirin:**
Beril Sönmez (Anadolu Kültür)
Birte Neumann (LaKI)
Ekin Su Birinci (Anadolu Kültür)

www.hep-beraber.org
www.alle-zusammen.org
www.germanturkishinitiative.org

**HIŞYARÎYA YASAYÎ DERHEQÊ LÎSANS û HEQÊN TELÎFÊ ya MAXI LÎSTIKê da:**

MAXI Lîstik li gor şertên xwarê çêdibe ku bihê jêzêdekirin û belavkirin:

a. Lîstik gava ku bihê bikaranîn, jêzêdekirin û parvekirin, divê kes û saziyên (lîsansorên) navê wan di kunyeyê da wekî  referans bihên nîşandan.
b. Di bikaranîna melzemeyê da divê kunye wekî referans bihê nîşandan, divê bihê dîyarkirin ka guhertin di melzemeyê da hatîye kirin yan na. Agahîyên referansî û guhertinê yên bo kunyeyê, bi şertê ku fambar be, bi her awayê maqûl dikarin bihên dayîn. Lê di dayîna van agahîyan da, divê ew întiba nehê çêkirin ku kes û sazîyên xwedî lîsans piştgirîya we yan jî ya bikaranîna we dike.
c. Bikaranîna ne-ticarî - MAXI Lîstik çênabe ku bi armancên ticarî bihê bikaranîn, jêzêdekirin û belavkirin.
d. Berhema li ser hatî karkirin, çênabe bihê belavkirin - MAXI Lîstik yan jî melzemeyên di nav qutîya lîstikê da heger ji nû ve bihên sererastkirin, guherandin yan jî rasterast li ser wan bihê karkirin, halê guhertî yê melzemeyê çênabe ku ji alîyê kesên sêyem ve bihê jêzêdekirin, belavkirin yan jî ragihandin.
e. Hikimê îlawe yê astengker çênabe bihê bikaranîn - Çênabe hikimên îlawe yan jî prosedûrên teknîk bihên bikaranîn ku hema tetbîqeka bi destûra lîsansê bi awayekî yasayî li kesekî din qedexe dike.
f. Kes û sazîyên navê wan di kunyeyê da, nikarin van heqên we betal bikin heta ku hûn li gor şertên lîsansê tevbigerin.

Ji bo agahiyên zêdetir, hûn dikarin di ser malpera projeyê ra bi me ra peywendî danin:

www.hep-beraber.org | www.alle-zusammen.org

Înîsîyatîfa Hevkarîya Elmanya-Tirkîyeyê di Warê Piştgirîya Penaberan da

Bi hevkarîya

ANADOLU KÜLTÜR

Kommunale Integrationszentren
Landesweite Koordinierungsstelle

Bi piştgirîya

STIFTUNG MERCATOR